# Derbarê navendên Pêş-dibistanî li Uppsala'yê

Navenda Pêş-dibistanî (preschool) yekem qonaxa pergala dibistanan li Swêdê ye. Qonaxa pêş-dibistaniyê xwebexş e û ji bo hemî zarokên di temenê navbera 1 heta 5 salî da li ber dest e. Beşdariya zarokê te li navendeke pêş-dibistaniyê, rêyeke gelek baş ji bo amadebûna wî/wê bo perwerdehiya neçarî ye. Qonaxa pêş-dibistaniyê alîkariya zarokê/a te dike da ew zimanê xwe bi pêş bixe. Pirraniya zarokan li Swêdê diçin navenda Pêş-dibistaniyê.

## Pêş-dibistanî bi vî awayî dixebite

- Pêş-dibistanî ji roja Duşem heta Înê di heyama rojê da vekirî ye.
- Di navenda Pêş-dibistaniyê da zarokê te taşte, navroj û xwarina sivik werdigire.
- Piştî navrojê, zarokê te eger hewcetî pê hebe, dikare bêhna xwe vede an razê.
- Li navenda Pêş-dibistaniyê hem li hundir e û him jî li derve ye. Ji ber vê yekê zarok hewcetî bi kuncên guncan li gorî keşûhewaya rojê û demsalê heye; weke kincên dijebaran di dema barîna baranê da û kincên germ di demsala zivistanê da.
- Hevrê di gel zarokên din, zarokê te dikare bistire, şêwekarî bike, bireqise, binivîse û biaxive (hem bi zimanê xwe yê zikmakî û hem jî bi zimanê swêdî).
- Fêrkarên Pêş-dibistanî û perestarên zarokan li navenda Pêş-dibistanî dixebitin.

## Zarokê te kengî dikare biçe navenda Pêş-dibistaniyê?

Eger tu wek dayîk û bav di halê karkirin, lêgerîna li kar, perwerdehî an di betlaniya dê û bavan da yî û li bajarê Uppsala'yê dijî, zarokê te dikare ji temenê 1 saletiyê va biçe navenda Pêş-dibistaniyê. Ji bo cihê zarok li navenda Pêş-dibistaniyê, pêwîstî bi dayîna pere heye. Mesrefa navenda pêş-dibistanî ya taybet bi qasî mesrefa çûyîna bo ya şaredariyê ye. Mesrefa xwedankirina zarokê te li navenda pêş-dibistaniyê li gorî derhata malbata te ye.

#### Hemî zarok ji temenê 3 saletiyê va xwedan mafê beşdariya li navenda pêş-dibistaniyê ne

Dema ku zarok 3 salî bû, mafê wî/wê heye ku biçe navendeke pêş-dibistaniya gelemperî. Eger tu wek dayîk/bav naxebitî, li dû kar, perwerdehî an di betlaniya dêbavan î, dîsan jî heman rewş derbasder e. navenda Pêş-dibistanî ya gelemperî tê vê wateyê ku zarok 15 saetan di hefteyê da diçe pêş-dibistaniyê û pêş-dibistanî belaş e.

**Derbarê pêş-dibistaniyên vekirî**

Çend navendên pêş-dibistanî yên vekirî li Uppsala'yê hene. Beriya destpêkirina pêş-dibistaniya zarokê te, tu û zarokê xwe, hûn dikarin bi hev ra bên pêş-dibisstaniyê. Pêş-dibistaniya vekirî cihê hevdîtina dêbavên bi zarokên ji 0-5 salî ye. Li wir zarok dikarin bilîzin û tu wek dayîk/bav dikarî dayîk/bavên din bibînî. Pêş-dibistaniya vekirî bêpere û belaş e û tu hewcetiyek bi navnivîsandinê tuneye. Tu dikarî agahiyên zêdetir di vî warî da bi lêgerîna peyva 'Open Preschool' li ser malpera uppsala.se bi dest bînî.

## Dema ku tu dixwazî ku zarokê te navenda pêş-dibistaniyê dest pê bike, pêwîst e vî karî cih bînî

- Du bijarde yanî pêş-dibistaniyên şaredariyê û pêş-dibistaniyên serbixwe (taybet) hene û tu dikarî ji bo ya ku vedibijêrî, daxwaza xwe bidî. Tu wek dayîk/bav li dû cihekî li xizmeta bi navê eBarnUngdom'ê yî. Tu dikarî wê yekê bi lêgerîna peyva 'ebarnungdom' li ser malpera uppsala.se peyda bikî.
- Herîkêm sê mehan beriya dema ku dixwazî zarokê te beşdariya li pêş-dibistaniyê dest pê bike, pêwîst e ku daxwaza xwe bo navendeke pêş-dibistaniyê bişînî. Li vê derê istîsnayek heye; Eger tu bixwazî ku zarokê te beşdariya xwe ji meha Tebaxê (August) va dest pê bike, wî çaxî pêwîst e ku ji çar mehan pêştir va daxwaz bidî.
- Eger te hejmara tomarkirina neteweyî tuneye, an eger naxwazî ku xizmeta elektronîkî (e-service) bi kar bînî, tu yê bikarî bi dagirtina forma kaxezî vî karî bikî.

## Eger te ji bo daxwaza navenda pêş-dibistanî hewcetî bi alîkariyê hebe, tu yê bikarî van babetan pêk bînî:

- Ji bo tomarkirina nav, serdana beşa resepsiyona kesên nûhatî li City Hall'ê ya li Stadshusgatan 2'ê bike. Kesên ku li wir dixebitin, dikarin alîkariya te ji bo navnivîsandinê û raberkirina daxwazê ji bo pêş-dibistaniyê di çarçova formekê da bikin. Eger hewcetiya te bi wergêr hebe, ew ê amadekariya vê yekê bikin. ew rojên Duşem û Çarşemê ji 9:00 heta 11:30 û Sêşemê ji 13:00 heta 16:00 vekirî û li ber dest in.
- Eger te ji bo daxwaza dîjîtal a pêş-dibstaniyê hewcetiya te bi alîkariyê heye û xwedanê hejmareke tomarkirina neteweyî ya Swêdê, 'mobile BankID' an hesaba xizmeta elektronîkî (e-service) ya 'eBarnUngdom'ê ya Şaredariya Uppsala'yê yî, tu dikarî serdana navenda têkiliyê bikî. Ew ê alîkariya te bikin da ku ji bo pêş-dibistaniyê daxwaz bidî. Cihê wan li City Hall'ê ya li Stadshusgatan 2'ê ye û her rojên hefteyê navebra 08:00-17:00 û roja Pêncşemê ji saet 08:00-18:00 li ber dest in.
- Bi hejmara 0771-727 001 di gel şaredariyê bikeve têkiliyê. Tu dikarî li ser telefona xwe bibijêrî, piştra reqema 1 ji bo pirsîna pirsên xwe derbarê daxwazê û cihê mayînê li pêş-dibistaniyê bibijêrî. Saetên têkiliyê ji Duşem heta Pêncşemê di 09:30-11:30 da ne.
- Bi hejmara 0771-727 001 di gel beşa resepsiyonê ji bo kesên nûhatî bikeve têkiliyê. Tu dikarî li ser telefona xwe bibijêrî, piştra reqema 6 bipelînî. Saetên têkiliyê ji Duşem heta Çarşemê di 09:30-11:30 da ye.